# SALNAMEYA COLEMERG Û BANDORA WÊ YA ABORÎ-CIVAKÎ

Engîn KORKMAZ
Zankoya Colemerg \ Turkiya

## Puxte:

Demên peşiye heta naha Kurdan dem ji xwe re pêvîst dîtine. Pêvîstiya van deman ji aliye aborî, çand, siyasî û civakî de pir qedr bûye. Ji ber vê çendê heman mehek cuda hatiye watekirin. Ew demên girîng; terş xudankirinê, rençberiyê û cotyariye'de hatiye rêxistin. Ya hemiye pêvist ewe ku, jiyana Kurda û bi taybeti ya Colemergiya, dem diviya bi hatiba plankirin. Ger dem bi plansaziyek baş derbas nebiba, mirov dê ketibanê pirsgirêkên giran, bi taybetî di xala aborî de wê astengi çêbiban. Her weha em dizanin ku her kes di civakek diyarkirî de ji nifşek din ji ciyekî din dijî, ku kesek dest bi jiyanê dike û heta vê jiyanê dawî dike û bi rengek dîrokî ya mayînde didomîne. Her çi qas kesek ji nava civakê û ji ber bandora vê civake çêbibe jî , şêwazê jiyana xwe ve jî bandorê dide civaka giştî.

Plansaziyên li ser avhewayê wê bên çêkirin, bi benda ve dê bên gotin. Li ser vi awayî em şên bejin ku Colemergiya jî weki miletên din, hemû meh û ev tiştên li ser van mehane da qevîmîn bi gotinên mezinan ve pek anine. Bes ji ber ku Salnama Mîladi (li ser esasê Taveye) û Salnama Hîcrî (li ser esasê heyvê ye) di mabeyna wan da 13 roj hene. Ber vî esasî hisaba mehan li gor Salnama Hîcrî hatiye bikaranîn. Şêwazê jiyanê li ser tekiliyên civakî ve pêk hatiye. Di vê xalê da civaknas Anthony Giddens dibeje; her kesek ji berku di nava civakekê da jiyan dike. Lebele ji kesayeta xwe ve jî bandorekê li ser jiyana civakî dike (Giddens, 2013:18). Ev gotinên Giddens, wek nivîskarê nave wî W. Mills jêra dibeje "Îmga Civaki".

Bı civakî peywendîyên mirovan li gor germê, sarê, biharan ji zivistanê cuda dibin. Em di vê gotarêda heyv bi heyv behsa xebatên Colemergiya û benden li ser hatine gotin tînin ziman.

**Peyvên Serekî:** *Kurd, Salname, Avhewa, Qelp, Meh.*

## Destpêk:

Peywendiyên bapîren Kurda di dîrokêda ligel xwezayê her hebûne, ji sermayê, germê, tiştên bedena esmana, gir gira radeya (Birq), barîna berf û barana , şînbuna gîya, bager, werina pela û her tiştêndin ên hevayî hatîne şopandin. Ev diyaroken e hemû demsalîne. Miroven sedasalên berê diviya ev tiştene şopandibûna û jixwe ra kelanderek civakî çêkirine (Orucov, 2012). Ji ber vê çendê meh, sal gorî zirai, aborî, civakî û keltorî ve hatiye binavkirin û li ser jiyana mirovan bandor çêkiriye.



Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Xwedayê mezin, xweza gorî nizamekê çêkiriye û pêvîste însan jî gorî vê nîzamê jîyana xwe rêve bibe. Mirov jiyana xwe sed salan derbas dike hinek şert û merca pêktînit. Mirovên Rojhilata Navin di şert û mercên giran da jîyana xwe pêktînin, ber vê çendê divê mehan, salan gori plansaziyekê rêbixin. Ji bo mînak, dema karê heyva Xiziranê ji meha Tîrmehê re ma wê demê astengiyên giran dê çêbin. Ji ber ku gîya vê mehê tên dirûnê. Em dikarin bejin ku ev plansaziyên han yên li ser av û hewa yê wekî keltûrên kevin tên şopandin. Bes vê demi mırov bajaran di jîn û keda xudanmirina heyvanî, rênçberi kêm buye ber vê çendi kelendera diroki ji wateya xwe kêm kirîye. Lê awayê jîyanê çend bêt guhertin jî mercên hewayê  weki xwe mane. Mînak li heremên Kurd lê dijîn bi kêmasî 6 meha zivistanê, lewma pêwîste ku rêxistina mirova jî li gorî wê be.

Gerdûna vê lêkolînê bi giştî li ser Rojhîlata Tirkiyê û bi teybetî jî li ser herêma Colemergê'ye. Ev xebatê li ser qelp û qulûpên zivistanê, şolên di wî çaxî da tên kirin û plansaziyên li ser çêkirî. Ev xebate jêderên devki hatiye komkirin. Dema me ev xebate lêkdayi mixabin gelek çavkanî peyda nebun. Dem û gotinên li ser hatî gotin dê gori exlaqê  zanistiyê bête nirxandin.

## Armanc û Rêbaza Lêkolînê

Armanca vê xebatê; rojhilata Tirkiyê û bi taybetî jî li ser gelê ku li herêma Colemergê jiyandike salnameyên xwecihî bikartînin û helbest jî li ser hatine gotin. Gorî ku ev xebate ji nûve tê çêkirin û salnameya li ser av hewa yê, tiştekî nû wê bê parvekirin. Ji ber vê rastiyê li ser  avhevayê gotin û helbestên anîne ziman girînge ku bên nivîsîn da kû nifşê pêşerojê' bizanin ew serdemên kevn Compiter û Televizyon nebûne  jîyan çawa derbaz dibû..

Dema ku mirov xebatên bivî şêwazî, û salnameya Tirkên Ahiska,  salnameya Afyonkarahisar a heremî, ya Uzunköprü, salnameya  heremî a Iğdir û di nav kevneşop û efsanên Tirkî de lêkolînên mîna salnameya folklorîk hene. Em di serî da di bejin me ev xebate bi devkî lêkdaye, xebatê da keda nivîskar Evdilkadir Ebû Sêîd gelek heye. Vi camêrî gelek agahî dane me. Ger mamê Abdulkadir û gelek mirovên din yên arîkarî daye me, em ji bo wan spasiyêk mezin dikeyn.

## Meh û Bendên Li Ser Hatine Gotin

Her cîvakekê li ser ax, av, germ û sirê hinek serhatî gotine. Serhatî, her weha di famkirin û ravekirina taybetmendiyên pêşerojên heyî yên jîngehê ku mirov lê dijîn de xweî fonksek girîng in. Jîngehê xwezayî, demsalên, avhewa, behreya mirovî, şêwaza xwarin û vexwarinê, şêwaza cilûbergên li ser jîna mirovan bandorek mezin çêdike (Özcan, 2012:2). Emê navên meha li gorî salnameya pejirandî (Salnameya Gel) li herêmê bihesibînin û ji ber vê yekê emê salnameya xwe bi navê Kurdî Berfanbar (Kanûn) di dest pê bikin. Lewma kû vê mehê pêz dikevît govan, û zivistan dest pê dike, ger aborê însana ger alifê heyvana bi havînê vê şêvazê tê hesibandin. Ger mirov vê hesabatê  baş neke wê bikeve astengîyên giran de. Ya ji hemiye girîngtir ewe ku


Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

şêwaza mirovahiye di vê rewşê de be. Erdnîgarî di rêyek ku civakên mirovî di form û rêxistinê de cuda û naverokên cûda digihîne xwedan cihekî girîng e. Dera kû mirov lê dijîn; çîya, newal an jî deşt bit wateya wê cudaye. Lewma jiyana mirova jî gor vê dimeşe (Korkmaz, 2014:24). Salnameya gelan ya Anatolyê sal bi du xalan pêktê: Rojên Xizir (186 roj ên, 6 ê Gulanê heya 7 Mijdar ê) û rojên Qasim (179 rojên, 8-Sermawêz heta 5 Gulan) tê dabeş kirin. Ev rewş di ravekirina guhertinên avhewa yên ji ber germ û sarê de tiştekî mihume (Koç ve Keskin, 2001:4).

### Navên Mehan:

1. Berfanbar (Kanûna Pêşi/ ya Biçûk)
2. Rêbendan (Kanuna Paşî/Kanuna Mezin)
3. Mehreşe/Sibat
4. Adar
5. Nîsan (Avrêl)
6. Gulan
7. Xizîran (Puşper)
8. Tîrmeh
9. Tebax
10. Rêzber (Îlon)
11. Kewçêr (Çirîya pêşi/ Çirîya Biçûk/Çiriya Sergarisa))
12. Sermawez (Çiriya Paşi/ Çiriya Mezin))

## Berfanbar (Kanûna Pêşi/ ya Biçûk)

Di Kûrdî de wekî Tirkî hinek navên meha ji çend peyva pektê. Bû minak Kûrdi navê Rêbendanê her wîsa Kanûn'a Mezin'e, Tirkî navê wê di bejin "Ocak" her wisa "Zemherî" ye. (Boyraz, 2006:225). Berfanbar; Bahdinan (Kûrdistan'a Başûr), Mahmudi (Colemêrg û Wan'e) û Botanê (Şernex-Cizîr-Silopya) bi Kanuna Biçuk tê binavkirin. Dema ku vê mehê deh roj derbasdibin Çile destpêdike. Çile weki navê wî jî tê fehmkirin çil rojên zehf sârin. Sir û sermaya zivistanê di van rojan de ye. Çile 20 roj Berfanbarê û 20 roj jî di Rêbendanê de ye. Di vê deme de eğlebe sirek hişk çêdibe û mirov nikarin ji mala xwe derbikevin. Her wisa roj gelek kurtin. Meha Berfanbarê de kêmasî dikeve agir û dû, yan jî sotemeniyê. Ji ber ku roj direjin. Li ser vê rewşê hinek gotin hene yek jî eve:

"*Kanunê em dakutandın.*"

Li ser Çile :

*"Çil Çilene, bîst Beçene hind jî hene*
*Heft zipkin, heft xirîpek, heftdî jî nik*
*Paşe şîndbin derdol û şîvik*
*Gaye xwe berde runexwar nik."*



Zakho Centre for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخو بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Van beytan sir û zehmetiyên zivistane derdikeve hole. Qelpên piştî vane ji bandora wan girane, lê ne wekî van in. Gorî gotinên bav û kalen Kurda dema ku meha Berfanbarê berf gelek di barît dê heta dawiya Adarê bi mînit erdî. Heke ku befr zahf ne barit wê demê dê zû rabit.

Dema Berfanbar gihîşte 22'ê şevek heye jêre dibêjin "Bêndilxe", ew şev bandora Çile zelal diket.

*"Bêlda Bêndilxe, heçi derkevit ji mala xwe*

*Dê bite qatile ruha xwe."*

Her wisa :

*"Kanun u mesilhet?"*

Ev gotina dîroki tê vê wateyê ku çi kesê Berfanbarê da biçît derveyî mala xwe dê rastî felaketê bê. Mînak em şên bejin yan wê bin reniyekê de bimîne yan jî dê li derkê bi qerimit. Gotina doyemîn jî zivistanê bi giştî jî meha Berfanbarê de mesilhetên mirovahîye pêk dianîn (Mînak; dahwet, jin xwastin..) na êne serrastkîrin. Ev kurte gotinene wê tiştê aşkera dikin ku zivistanê kar û xebatên mirovahiyê bêmecalin. Mezinên Colemêrgiya di bejin dîrokekî direj de gundekî giredayî bajarokê Çelê giredayî ye Colemêrgê jêre dibejine "Xanê", di vî gundî serdemên kevnar de Kurdên Êzdî lê di jiyan. Êzdiyekî xwedan teybîr û hesabdar ê bi navê wi Sîdoye, evarekê fikirîye ewr û rewşa hevayî û ev biryarê didayê: "kurenmin rabin gameşê xwe serjê bikên, ji ber ku dê berf gelek bê û hûn dê heta siharê berfê ji ser xanî bi malin". Di serî de kurên wî pîremerî dijî babe xwe derketine pişt re gamêş hatiye serjekirin û her heft kurên wî câmerî heta sibe berf avetîye û goşt xwarine. Tê gotin ku li wî gundi bi tenê ew malbat maye sax û hemî gundiyên din dibin berfê de mayîne û jîna xwe winda kirine ( Ak,2016:455).

## Rêbendan (Kanuna Paşê/Kanuna Mezin)

Navê vê mehê di nava Kurdên Botan û Bahdînan de wekî Kanuna Mezin tê binavkirin. Vê mehê 20 roj Çile'ne. Vê mehê sir û serma gelek xedarê. Dawiya Çile qelpekî mezin heye, jêre di bejin "Heyhot". Heyhot di navbera 30-31 Rêbandanê de ye. Ev gotina dîrokî li ser Rêbendanê hatiye ziman:

*" Heyhot Heyhot jêk webûn mehên cot*
*ecêp dınya ji ber ne sot*
*babê kur fırot da bi dar û sot*
*daykê keç fırot da bi kezan kelot."*

Peyama vê vegotinê, zivistan kêmasiyên mezin dide ser alifê heywanî û aboriya mirova, dema ku gihîşte 20 Rêbendanê Çile xilas dibe û Beçe dest pê diket. Beçe jî bîst rojin û bi giştî gelek sar derbaz dibin. Dema kû Çile ve Beçe di deynê beryê ev gotine heye:

*" Çile sir û sermaye, Beçe befr û baye"*

*"Çile di bêjit ez li ber kuçkê tenûrê çêtkem cemedê,*

*Beçe di bêjit ez gûlkî di qerimînim di zikê makê."*

Anadolê gotinekê li ser di bejin "Hamsîn" vana pêktêt: "Sayili doksan"; Erbain (40 roj) û Hamsin (50 rojin) peyva "Hamsîn" hejmara van herdû peyvane ye. vir "Hamsin" 50 rojên mabeyna Rêbendan û 21 Adarê ne. Vî çaxi da jî sir û seqem heye. Gelê Tirk van rojane hûsa di bêjit: Hamsîn dibeje zemheriye, ''hêza te min heba, min dê girara li ser agirî de qerimandiba''. Zemherî di beje Hamsîne, tu ji min dijwartirî'' (Özdemir, 2006:53-82). Jorî Çilê û Beçe weki me parvekirî aliye Tirka ve jî Çile û Beçe hatîne daneberî.

Ev tişte gelek girînge, dema kû Çile xilas dibe gorî Salnameya Êrebi (Çilê Erebi) germahî zêde dibin û jêre dibêjin "Pela Biye" anku germahî weki guriya dara Bîye ye. Lê roj bi roj germahî zêde dibe. Ew rewşe dîyar diket ku "Cemre" di kevite hewayî. Cemre 20 Mehreşê di kevite hewayî. Cemreya duyê di kevite avê, ev jî tekabilî 27 Mehreşî diket. Dema ku Cemre di kevite ave jêra di bejin "Pela Dindarê. Cemre sêye 6 ê Adare'ye û Cemre dikevite axê jêra di bejîn, "Pela Kezanê ", germahî herî zêde dibe, roj ber biharê ve diçe.

## Mehreşe (Sibat)

Beçe 11 heyva Kanun'a Paşê (Rebendan) destpê diket heta 9 Mehreşê di domînit. Nava Beçkê şevek heye jêra di bejin "Xidre Nebi û Xidre İlyas" bendek bivî rengî serda gotinê:

*" Xidre Nebî û Xidre İlyas*

*hinde du mehên zivistanê xilas*

*herdu şevêt miraz*

*Mem u Zîn bûne miraz*

*hinde nîveka zivistanê xilas."*

Li gorî çîrokekî kevn, keç û kurên yekane anjî bê dehvet li van şevan xwarinek bi navê wê Pûxin dixwen. Materyariya pêwîst ji bo vê xwarinê ji 7 malan pêk tê û xwarin tê çêkirin. Di vê şîvê de gelek xwê tê zêdekirin. Keç û kurên tenê yên ku vê xwarinê dixwun diçin razanê vê demêda gel çû kesan ra naaxifin û avê na vexwun. Ger ev dibînin ku ew di xewnên xwe de li ber deriyê malekê av vedixwen, tê gotin ku ger kurê


Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

ku ave divexwe, keçikê ji wê malê digire, heke ew keçik e ku av divexwe, tê wateyê ku ew dê bi zilamek ji malê ku ava wî vedixwe re bizewice. Di vê anekdotê de bûyer carînan ji hêla nivîskarê va nûsxeyê jî di gundê xwe ve tê ceribandin. Ji bo şevên Xidrelez di Salnameya Gelên Gurcî ya Başûr de: "Xidir Ellez li hespê siwar dibe û digihîje her kesê ku di sibata (Sibat) de bigihîje. Ez Hidîr alîkariyê didim kesên ku di rê de, li çolê. Ji bo dîtina Xidir bextewar e.

Dema Beçe bi dawî dibe, hewa dest bi germiyê dike, roj dest pê dike ku tîrêjê geş bike dema ku tav ser berfê dide, çavê mirovan tarî dibe, mirov dikare bêje ku ev heyv bi Kurdî Mehreşe tê gotin:

Wekî tê zanîn, cîranên kevnar ên Kurdan Asûrî (Nesturi) bûn, û vî gelî wekî "File"[(1)] tê binav kirin. Ev komên mirovan heya sedsala 20 mîn de bi kurdan re rojên pir xweş û bê êş borandine. Rojek heyva Mehreşê da kesek Aşûrî navê wî Yûxenna û hevalek xwe, çûn herêma ku jê re dibêjin “Şine” li ser riya Çel a li ser Colemêrgê ye. Ev hevalene ji bo nêçîrkirina heywanên kûvî çûyne Şine, û ev her du hevale mayne bin renîya berfêda. Laşê hevalê Yûxenna tê dîtin, lê laşê Yûxenna bi çiyayê Şineyî ve dimîne hilayîsti (da liqi), heta ku 13-ê Sibatê de bi nermbûna hewayê tê xwarê. Li ser vê bûyera nêçîra Çiyayê Şineyî gotinek û stranek heye (Ak, 2016:261):

Hey çiyawo çiyawo
Malwêrano çiyawo
Ser pîto bi gilo giyawo
Şaxzirav lê geryawo
Ser çiyayê Şineyî

Hêlîna şax koleyî
Silav li Samoreyî
Malwêrano çiyawo

Şine b’şax û zinare
Berda çem û robar e
Hêlîna gîsk û kare
Malwêrano çiyawo

Şinewo hey xweş şine
Nêçîrvan ne kujin e
Heyfa nêrî bizine
Malwêrano çiyawo

*“Ne berya 13 Sibate bihare, ne piştî 13 Sibate zivistanê.”*

Wekî ku tê fêmkirin, piştî 13-ê Sibatê, berf hêdî hêdî dest pê helyanê diket. Hin kes şeva 13’ê Sibatê êvarê bi navê "Agirê File” tê binavkirin. Li ser vê êvarê çend nerînên cûda hene, em ê li ser du ji wan bipeyivin. Hin ji wan kêfên Aşûriyan in ku herin ser bana û şewatek dişewitînin piştî ku cenazeyê Aşûrî Yûxenna hatiye dîtin ku


Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

me li jor behsa wî kir. Gotinek din jî ev e ku piştî vê tarîxê, roj û şev dest bi germbûnê kirin, piştre mirovên ku li wir dijîn, çivîkên biçuka li ber çavan radikin û ji keyfa da agir berdaynê. Bi rastî, hene ku vê şevê dibêjin "Landika File".

Ji ber ku ev du rojên Sibatê de 28 roj derbas bû, di dîroka Kurdan û cîranên wan yên berê de, xelk her şev di malekê de civiyabûn û bu xwe gelek xweşi çêdikirin. Heke xanî zêdetir ji 28 be, dê hêjmara xaniyan li 28 dabeş bibe û pilanek dê were çêkirin. Ji hêla din ve, efsaneyek bi navê "Pîre Fatê" hebû, di vê baweriyê de ev jina hanê li her malekê, êvara paşîn ku anji bi şev gihîştî 28 ê Sibatê de pêwîst bû ku bête derîkirin, an pirsgirêkên girîng ên aborî dê li seranserê salê werin qewimin.

Her weha din nava Sibatê de hinek roj hene jê re di bejin " Çarşema Zipa[(2)]". Ev rojên han dudûne; yek ji Sibat'e dane, yêk jî sere Adarê ye. Van rojên han barîn ne bare çêtire. Âdeta Zîpa eve kû kesên keçên xwe yên zewicandî gazî bikin û wan xelat diken. Ev âdete serdema Dewleta Kûrda ya Mîtanî (Berî Zayînî 13 min sedasalê dijîn) u heta roja me heye (Dargûl, 2019:64). Çarşem"ed Zipa 28 Sibatê heta 13'i Adarê dom dikin, her wisa ber germahiya vê deme mirof di bejin "ax Sibat" anku êdi germi û xweşi çê dibin (Penvin Rauf Hadi, 2018:912-913).

Ser zipa jî ev gotinê hatîye;

*" Zipe zipe darê, heke barît Biharê*
*Heke ne barît, sirre semedarê."*

Çarşemêt Zipa, di çanda Kûrda da cîhek gîrîng digire. Di wan rojan de, mirov gazî keçên xwe yêd zewicî dike, xwarinê dixwun û diyariyên cûda didin wan, hema mîna merasimêkê ye. Bi heman awayî, tûjikê ji porê zarokan qut dibe û li hewa diden. Day û baba van zîpa, weki bab û qalên xwe, ji bu zaroka çêdikin di dene bayî. Ger Zip xweş zivirîba tê wê wateye kû sal dê baş derbas biba, ger hêdî bi zivirîba sal wê awarte ba. Zipe'ya Adarê jêra di bejin "Zipa Hêka". Ciwan bi hêka ve dilîzin û hêka lek didin, hêka kê bişkê ewî leyiz windakir. Velhasil ev gotîn û serhatiyên di dîrokê da her hebûne, û gelek caran jî rastî jî di navê de hebûye.

## Adar

Wateya peyva "Adar" eve: Ar-Dar. An kû zivistanê dar û dûye mileti kêm bûye, her wisa aborî jî nemaye.

*"Herdu Çirî Mîrin, herdu Kanûn Wezîrin*
*Sibat û Adar mehêt fekîrin*
*Nisan û Gulan mast û şîrin*
*Xizîran u Tîrmeh mehêt tîrin*
*Tebax u İlon mehên pîrin."*

*"Adar mıhek xware*
*ne ser u ne bin gârê."*


Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Wateya vê beyte eve kû dibe Adar xweş derbas bibe, belku jî Adarê berf û baran zehf bibin û de rewş awarte bit. Gotinek Tirka jî ser vê mijarê heye û waha di bejin: "Mart kapıdan baktırır, kazma kürek yaktırır" anku Adar di derîda xwe kifş diket, tevr û bêra xweş diket (şewitînit) (Aksoy, 1984:316). Çend qelpek din ava Adarê da hene. Heftêya yeke mîn jî di bejin "İna Pit", vê rojê gerek hewa barîn bît da ku paşê rojên xweş çêdibin. Ji Anadolê di bêjne van roja "Kocakarı Soğukları" anji sermayen qala. Sermayên qala (berde-l acuz): navbera 11 Adar û 18 Adarêda ne, êdî dawiyên serma zivistanê ye. Erebî jêra di bejin Berd û Arûz an ku ''berd''sar ''acuz''pîrîti (Bozyurt, 2011). Piştî van rojane qelpa " Gîskê" heye. Giskê de berf û ba çêdibit û mirov nikarin behnê raken. Piştî Gîsk'ê "Hejdehî" heye her wekî tê fehmkirin 18 yi Adarê ye. Eve jî rojek girînge, mirov hesdiken barînî bit, xwarinek taybetî çêdiken û jêra di bejin "Keşke"(3).

*"Adarê melaket hate xwarê*
*av çû gûlya darê*
*nîşaneyek ya Biharê."*

*"Hejdehî Adarê,*
*Melek'ê Êzdan hate xwarê*
*nîşanek yêd biharê."*

Piştî Hejdeyî'ye 21 Adar diet, yan jî weki navê xweş Newroze. Nav Kurda'da Newroz rojekî navdar û girînge, wateyek we jî Îyda Biharê'ye. Vê rojê, bi kevneşopî "Festîvala Biharê", rojek di nav gelên kevnar ên Mezopotamya de tête pîroz kirin. Her weha ew yek ji rojên tofaniyê ye ku tê giranî baran bibare. Her wisa vê rojê şev û roj hevseng dibin.

"*Newroze Newroze ne şeve ne roje*
*ne nizare, ne beroje."*

## Avrêl

Avrêlê wekî 1'ê Kanûnê (Noel an jî sersal), li hemû cîhanê tê pîroz kirin, gelê Kurd jî vê pîrozbahiyê bi coş pîroz dike. Gelê Kurd di vê mêjûyê de xwarinên taybetî çêdikin, yên herî balkêş jî: Gulûl, Doxaba, Mehire, Kiftik, Qirîs, hwd .. Di meha Avrêlê de, Eydên Kurdên Êzdiye ji daweta xwe dikin û dibêjin ku ev meh meha xwe bûk e. Bi gelemperî pir baran dibare. Serdemên kevn de bi giştî Kurdan Şahiyên xwe nedikirin. Ev kevneşopiye li gund û warên herêmên Hekariyan de jî heya koçberiya salaên 1990' de jî domdikir. Lê niha bi tenê Kurdên Bahdînan dehweta naken berku bêyûmiye.

*"Avrêl rojbuna sal, Zik bûne çal*
*Pala nema çi hal, Kabanî mane betal."*

Bûyera herî mezin di destpêka Avrêle de "Avetîrk e”. Wateya Avetîrk “barîna berfê / barîna barana tîre. Ev baran hin caran 10 roj, hin caran jî 7 rojan didomîne. Van rojan bi giştî berf û baran in. Gava ku mirov heywanên xwe ji bo zivistanê amade dikin, heya dawiya Avetîrkê hesabê dikin. Bi gotinên din, bêrî ku Avetîrk ne derkeve, kesê nedihişt heywanên xwe ji govan derxe û bibene geliyan ango deverên germ. "Gelî”. Di demên kevn de, di van rojên Avetîrk de, wesayîta veguhastina şîrê ya bi navê Meşk li binê avê hiştibû, heke Meşk şil bûya, ew ê salek dê baş ba. Loma ger em li vê çîrokê guhdarî bikin, em ê viya zelal bikin. Rojekê, Mîre Badinan Zubeyr Paşa bagurdanek zêrî didanîte nava Diwanxana xwe û hemî aqilmendên xwe berhev diket û vê sûalê jê dikedi beje: “gelo wateya vî bagurdanî çiye?” her aqilmendek tiştekê di bejit lê Zûbeyr Paşa qanih nabît. Dor diête seraqilmendî wi Îse Delan û İse hu dibejît:

*“Mabeyna Nîsan û Gulanê biet taviyekî baranê,*
*Ser deşta Dibanê, çêtırej wî bagurdanê diwanxanê.”*

Serhatiyek Tirka jî eve: *“ Baranên Nîsanê, maşîna zêr û tekera vê Zîve”.*

Encama vê kurte çîrokê û serhatîyê eveye: ger baran û berf ne barin dê bajar têkda hişk bin, genim, garis û hemî aborên din dê kêmbin, xelahî û nesaxî dê zêdebin. Her wisa giyayên heywani jî dê kêm bin. Ji ber ku tine debara gundiya pêz û heywanê dê veca terş qirdbît. Weki din ger barîn zehf bit, dar û bar dê geşbin, debara heywani dê zede bit, hasilî mirov jî dê keyf xweşbin.

Careke dî 24 Avrêl’e da ji rojek qelp heye, jêra dibejin “Qelpa 24 Nîsanê”. 24 Avrêl’e caran mitroyekî berf hatiye. Gotina ser vê qelpê ji eve:

*“24 Nîsanê heft bûhûst berf hate xware,*
*Gamêş çûne garanê hatneve, gûnî danê*
*serê Şatax û Nedwane.”*(4)

Wateya vê eve, eger gîya bilind nebit heywanên reşe nikarin bixwen. Bi gotinek din 24 Avrêlê heywanên reşe di çeriyan.

Ser meha Avrêlê Tirka ev gotine heye: ”*korkma hamsinin kışından, kork Abrulun (Avrilin) beşinden öküzü ayırır eşinden.”* Careke din di bêjne Avrêl’e “camış Kıran” an kû gamêşa di kujit.

Ji demen bere gundiyan Payîze di çand û Payîze ewilî bihare şîn dibîn. Ger 24 Avrêl’e berf hatiba û cemed çêbiba dê Payîze pûç biba. Sala 1948, 24 Avrêl’e jêra di bejin “Sala Qirê” û gelek caran miletê Colemêrgê ev roje bû bîraniya behs diket. Mesela dema kû tiştekê da bîr bînin de bibejin “beri Sala Qire an jî pişti Sala Qire ye?”. Di vê salê da bab û kalên nivîskarê vê nûsxeyê jî di gundê Xenanisê, ku giredayi Colemêrge, heywanên xwe der dayne.



Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

Ji heyva Avrêl'e da rojekê di bejin "Çarşema Sor". Vê rojê keyf û xweşi diêne çêkirin, taybetî ji Kurdên Êzdî bi coş vê roje piroz dikin. Ser vê rojê jî eve hatiye gotin:

*"Biharê xwe terneke*
*Payîze xwe direng neke"*

*"Tebêt bihara xwe bidene ber tilêt daran*
*Tebêt payîzan xwe biden ber tilêt Çinar û gûzan"*

*"Nîsan dibejit ezîm keça ser reş*
*cûh û cûhbaran şîndibin binevş*
*her ezim nav mehada xweş."*

## Gulan

Wateya vê heyvê gul û çîçeka tête navkirin. Ji ber ku vê mehê'da gûlên rengîn ve dibin, her wisa ew keçkên dayik di bin navên wa dikene "Gulê, Gulistan". Roja yekem a Gulanê wekî rojek ked û hevkarî di nav Kurdan de tê pîroz kirin ji ber ku ew li seranserê cîhanê.

Meha Gûlanê, gundî û rêncber hes diken kû baran zehf bên da ku gîya û bereketî zêde bibit. Û vê mehê paşda careke din ev kesene ji boy zivistanê xebatên xwe bê navber di meşinin. Pezê gûndîya ji geliya vedigerît û dema pêz Dotinê ye. Ser vê mehê jî gotinek heye:

*" Meha Gûlanê kele kela mihanê"*
*" Meha Gûlanê şevê nabarînît baranê, lewma pezêt kovi ber zanê."*

## Pûşper/Xizîran[5]

Destpêka Xizîranê şxole heri girîng ewe kû gundî pêz'e xwe di birin anku hiriya wî jêvediken, ev kede bi vî awayî di hate qetandin. Hizîranê giya têne dirûnê, fêkî bi ber çêbûnêye, pêvîste kû mirov kare zivistanê bikin. Eger kû plansaziyek baş neyê çêkirin wê tengasiyên mezin çêbibin. Amade bûna herî mezin ewe ku giya biêne dirûn, ji ber ku roj direjin. Ev gotine li ser vê mehê hatiye çêkirin:

*" Xizîran hat û xizrî, giyal erdîve kizirî*
*tiştek xwelber nagirît jı xeyni*
*dar û berî Mewa tirî."*

Kanûnê di bejin: “13 Kanunê Rojê bere xweda havinê”, Xizîranê j idi bejin: “13 Xizîranê rojê berê xweda zivistanê”.  Ev beyte ser direjî û kurt buna roja hatîye gotin. Xîzîranê dido awr hene dik evine asimana: yêk eve kû di bejinê “Awrêt Netrana”, ya didoyê “Awrêt Pêşemana”. Avrêt Netrana ya wane evên rojên direj bê xîretin, nikarın xebatê bikin. Ya dî ji eve kû ev kesên kar û barên xwe ne kirî û lê pêşeman bîyi û lê dest derketiyî, berk û edî gîya behî bûne.

## Tîrmeh

Wekî tê zanîn, ew mehek e ku hewa germ dibe. 4 rojên destpêkê yên Tîrmehê hewa ji bo çar mehên din diyar dikin. Roja yekemîn Tîrmeh, roja duyemîn Tebax e, roja sêyemîn Îlon e, roja çaremîn Cotmeh e. Ji 10 Xizîranê heya 20 Tîrmehê, di bêjin “Çilê Havinê”. Di vê heyamê de hewa çil rojan pir germ e. Bi vî awayî, deh rojên Tîrmehê yekem rojên "Bixur" tê gotin. Eyyam-ı Bahur (Koç û Keskin, İbid) di salnama de jî wekî (Bıxur) tête navnîşan kirin. Bixur di destpêka Tîrmehê de dest pê dike û 12 rojan didomîne. Tête gotin ku her roj mehekê, her mehek salê temsîl dike. Vê serdemê belkî berî Islamê ye, kalemêrên dema 12 keviran her roj kevirek avêtin ser rojê, her kevirek hate rakirin û li pêşiya çavan ger heb kevirekî şil e, ew ê mehên baranê, heke hişk ba we baran ne barîba.

Carek din, yek ji rojên herî girîng ê Kurdan ku bi evên xwedîkirina heywanan re mijûl dibin, "Berxbir (Mîhrîcana Berx Birînê). Ew di navbera 15-ê Tîrmehê û 30-ê Tîrmehê de her sal tête bi karkirin. Roja pêşîya Berxbirê, Berxşo (Washuştina Berxê) vê rojê li gerekê tête çêkirin berî ku, hemî gundî berxên cudaxwaziyê nekin, tevahî berxa di şûn. Di roja Berx birê de, her kes zû radibe, dikeve hundirê berxan û têlên berxên li ser çadir an jî xaliçekê qut dike. Di vê rojê de, zarok, jin têne xemilandin, giskên qelew têne serjêkirin û birajtin. Carek din, yek ji taybetmendiyên herî girîng ên vê rojê heq û hisabên Şivanên berx û pêzî gir diêne dîtin. Ji ber ku dema mehên biharê şivan diêne girtin qewlê heqên wan ser firotina kavirên nêr (berx) diête dîtin. Dema kû berx firotin gerek pareyê wan şivana her hevkerek an jî gundiyek gor pezê xwe bi qetînit.

Ji hêla din di Navenda Colemêrgê roja "Şêx Nazir”, ku di 29 Tîrmehê de ye, rojek girîng e û diête pîroz kirin. Vê rojê “mirtûxe an jî arxafka tîr diête çêkirin û xêra Şêx Nazir diête belawkirin. Wateya vê rojê hem kû rojekî piroze, yekê jî keyf xweşi diête kirin.

## Tebax

Di vê mehê da germ roj bi roj zede dibe, her wekî meha tîrmehê germahiye. Di vê mehê de giyayên dirûnî diêne berhevkirin. Bi germahiya Tebaxê re, peyv heye:

*“ Mabeyna Tîrmeh û Tebaxê Gurî radibît axê*
*Mewîj çune mûştaxê*
*Xweşin zozanên Şaxê.”*



Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەری زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی

6 Tebaxê Gilawej (Venüs/Stêrka Şivana) diyardiken asîmana, Gilawej komekî sterka ne, nîşaneke ya payîzê, dema ku Tebax gîhîşte 15 û evraz, hedî hedî hewa ber bi sariyê ve diçe. Li ser Reşmalên zozana xûs di çêbe. Edî deme ku zozanî ber bi gunda ve barken, rûn, nîvişk çêdken, dema Gêra ne. Gûrzên Genîmi ber pên heywana diête gêre kirin. Berîya 30 sala, gêre bi Canegaya di kirin ser Cûxînê (Cûxin, erdeki rast herî (kûr) çêdkirin û dema hişk bu ser vê dere Gêre dikirin) Gêre di hate karkirin. Paşda êdî patos derket û ev şxole hate hêlandin. Dema piştî 15 î Tebaxe roj ber sariyê ve di ço, ser vê Anadolê eve hatiye gotin: "Ağustosun on beşi yaz, on beşi kış" an kû 15 roj Tebaxê havinin, 15 roj zivistanin (koç ve Keskin, İbid). Ser Gîlavej ê ev hatiyê gotîn:

*"Helavêj u helavêj*

*hatin pêr û gelavej*

*yarê yakiri nivej."*

*Spêdeye roj limin tifiqî*

*Ser sîngê şenge dostê zêrê biriqî*

*Gelavej a mal xirap hat û veciniqî."*

## Îlon/Rezbir

Navê vê mehê Rezbir e (an kû genim dirûnê) diête navkirin, ji ber ku edî hin de pêvîste genim biêne dirûn û rakirin. Koçer êdî di kevine deşta, sir û serma herî zede dibit. 13 İlonê jêra di bejin "Eyde Silîve" serma destpêdikin. Eyde Silîve, ji aliye gelê Aşûrî ve wekî îydekê pêşwazi dibit. Wateya vê ewe kû êdî demê bêhn vekirinê ye. Her wisa ger kû gundiya debara wxe ne berhevkiribin, pêvîste zû berhev bikin, "Texê li texê bide û rake". Şîr'ê pêzî gelek qedre lewma ku rûne.

*" Mastê İlonê bidene Xatûnê."*

Taybetmendîyek İlonê ewe ku roja Beranan e (Beran Berdan) eve jî bi coş û kêfxweşî diête pêşwazîkirin. Ji bo vê yekê dem heye, mîyek bi qasî 5 mehan ducanî dibe, lewra 'Beran Berdan' bi gelemperî di navbera 5-10 Îlonê de li gorî Salnameya Kurdî tête çêkirin û zayîn di 5 ê Sibatê de dest pê dike. Ger ku Beran Berdan zû bit, gundî wê deme di kevine nav tengasîya da ji ber ku alifê heywanî kêm di bit, mesref zehf diçît. Roja Beran Berdanê, Beran diêne boyax kirin û zarok di danîne ser pişta wan, wel hasil rojekî girînge.

# Kewçer/Çirîya Ewil/Çirîya Sergarisa

Di navê vê mehê weki tê zanîn Kew da dikevinê deşta, roj bi roj ber bi zivistanê di çît. Şev gelek direjin û gelên gunda van şevane kom dibin ji xwera Çîrokan dibejin, ber vana fêkî dixwin hwd.. Ev mehe destpêka cotmehane, jêra dibêjin Çiriya Êwil anjî ya biçûk e.

*"Şevêt Çirya, Şêlim û Şirya ji ber direjiya şeviya."*

Ev gotina jorî li ser dirêjiya şeva hatiye çêkirin.

## Sermawêz/Çirya Paşê-Mazin

Navê vê mehê Çiriya Paşê sir pir zêde dibit, bû zivistanê rojên hejmar hene. Jinên gûnda gorên rîs çêdikin, aborê zivistanê an jî debarê kom diken. Li ser vê rewşê jî eve hatiye gotin:

*" Hatin herdû Çirî*
*Berf hat katirî*
*Malxwe malê ber Kabaniya xwe mirî."*

*"Çirî hat Çirî ve*
*Xem hat xem dûv ve*
*Derê xema vebû ve."*

Ev her du beytên jorî li ser zehmetiyên zivistanê gotinê û dema berf zehf hat wê debara mirovan, alifê heywanî pêwiste gelek bit. Ji Anatolyê li ser vê mehê ev hatiye gotin: "Kar yılı var yılı" an kû "sale berf, tiştek tê heye" (Hacılı, 1992:112).

Bi van gotinane ve micare xwe anî dawiye. Da kû babeta me zelal bît me dido serpêhati û benden wan li jêrî nivîsîne. Keremken meze bikin van serpêhatiya.

## Stıran û Serpêhatıya Reniyê

Eger Em bû mînak ser zehmetîyên zivistane Çirokek dîrokî bi bejin: Berkû havîna miletê gundî nedigihîşt kar û xebatên xwe yêd civakî biket, lewma kû şxolê wan zehf bû. Ji ber vê çendê dahwet di êxistine zivistana. Navbera 1200-1300 gundêd Colemergê yên dibejin Talê û Xanê (ser Çelê ye) xizmaniyek çêdibit, dahwet kevîte meha Kanûnê. Ji Xanê rêdikevin û têne Talê bûka vedgûhêzin. Dema kû ber bi Xane di zivirin, bûk û berbûk di minine bin renîya berfê da, an jî aşût di qulupît (dibejin heft bûk bûne, belku ji efsanye ev gotine).

Ser vê bûyera tahlda stranek 20 rêzika hatîye çêkirin, me ji sê rêzik hilgêrtine jêri:

Hey renî renî renî
Hey Naz[6] delalê Nazê
Verestî bu j'beteni
Biribun kesêd benî



Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەكۆلینێن كوردی

Ew xanîne, lew dînin
Hey Naz delalê Nazê
Heft bukan gelyêk tînin
Qinyate xwed qelînin

Rênya serê Taleo
Hey Naz delalê Nazê
Verestî bu j'nihaleo
Birî bûkêd saleo (Kaplan, 2015:243).

## Stıran û Serpêhatıya Gelıyê Qewalê

Tê gotin ku ev stirane di dema daweta Eliyê Qewalî û bûk jî Dîwana keça Mîrxanê Nîşeyî, di dema veguhastina bûkê de dawetî tengasiyekî pir mezin a berfê jiyandikin hatiye gotin. Dawetiyên wan di salwextekî zivistanekî pir giran de sibê ji gundê Qewalê derketine êvarî gihiştine gundê Nîşê, sibê bûke hilgirtin û dane rê di wê deme de berfekî pir bê molet barîbû, dawetî di nîva gelî de ketine qeyda berfê û neçar mane û tiving teqandine ku bi denge tivingan hevdu peyda bikin. Ji aliye Qewalê ve jî hewar gihiştê wan jî denge teqîna tivingan bilind kirin, navê çeken wê deme jêre digotin şeşxane denge şeşxaneyan tejî gelî bûn, ji tengasiyê xelasbûn û ber êvarê gihiştin gundê Qewalê. Dengbêjên wî serdemî ev stirane pêre çêkirin (Ak, 2016:286).

Geliyê Qewalê kûre Narê hey narê
Şeşxanan lore, lore sorgul jê d' barin
Qutkê Narê mexmûre bûkê nazdarê

Geliyê Qewalê tenge Narê hey narê
Şeşxanan veda denge sorgul jê d'barin
Qutkê Narê heft renge bûkê nazdarê

Geliyê Qewalê ave Narê hey narê
Şeşxanan deng vedan ve sorgul jê d' barin
Pîroz bin bûk û zave bûkê nazdarê

Kanûn û herdû çirî
Befir hat û kitirî
Day û weled jiyêk kirî

Kanûn û çirî çarin
Seran befr lê dibarin
Narînê roj hejmarin

Dengbêj: Silêman (Ehmed Duman)

## Encam û Şirove

Di dirokê da, mirovan carna bandor daye ser xwezaye, carna jî xwezayê bandor xisti ye jîyan, abûr a mirovan. Encama vê bandorê; Çîrok, beyt, serpêhati hwd.. ya hatî heta roja me. Dema ku mirov mêze jîyana Kurda di ket, rewşa avhewa pir girîng hatiye qebûl kirin. Ser vê em şên bi bejin bi Kurdî, rojên "Qelp û Qulop" hene û eve ne bi serpêhati ya ve di hatîne ziman. Ev serpêhatiyên ser avhewa di hatîne gotin, ser şêwava jîyanê ne. Me jî vê babetê da behsa Qelpên zivistanê û metelokên hatîne gotin yê nivisîyî.

Em şên bibejin kû roja me, hemi kalender, salname, rojmêr yê ketîyî compiter'an an ji elektronîkin. Lê paşeroja bappirên me jî pêwiste ku em bibir nekîn. Salnameyên naha ji gorî yên kevin hatîne çêkirin. Salnameya gelan bi xwezayê, şxoli, jîyana hevpar çêbi ye.

Wekî encam, bi kurte em şên bi bejin ku gelek girînge jiyana mirovên beri dema me, roni di daye rojame, her wîsa jîyana bap û qalên me ya aborî, rojane, çandi pêviste biête zanîn. Me vê xebatê de, ev tiştên di nav gelan de bi salan hatîne gotîn û seretayi 'Salname ya Gelê Colemêrgê" bi jêderên akademik bi lêkdan û nivîst. Em wê hêvine kû ev xebate roniyê bi dete rîya nifşê pêşe roje,,,

## ÇAVKANÎ


1. **Ak, W.** (2016).Çil Kelatên Kurdistanê, Sîtav Yayınları, Van.
2. **Aksoy, Ö. A.** (1984), "*Atasözleri ve Deyimler Sözlüğü",* Cilt:1, Ankara: Türk Dil kurumu Yayınları.
3. **Boyraz, Ş.** (2006), "*Fal Kitabı, Melhemeler ve Türk Halk Kültürü*", İstanbul: Kitabevi Yayınları.
4. **Bozyurt, O.** ve **Koca, N.** (2011), "*Başlıca Coğrafi İçerikli Atasözleri ve Bunların Milli Kültür Açısından Analizi",* Sosyal Bilimler Dergisi / Cilt: XIII, Sayı 1, Haziran-2011.
5. **Dargûl, D.** (2019). Di Dêroka Kurdîstanê Da Çel, Weşanxaneya Sitav.
6. **Giddens, A.** (2013), "*Sosyoloji, (Başlangıç Okumaları)"*, Çeviren: Günseli Altaylar.
7. **Hacılı, A.** (1992), "*Geribem Bu Vetende",* Gençlik Yayınevi, Bakü, 1992. (Aktaran: Minara Aliyeva), SAY Yayınları,
8. **Kaplan, Y.** (2015), "*Kaniya Stranan",* Nubihar Yayınları.
9. **Koç T. & Keskin N.** (2001), "*Uzunköprü'de Halk Takvimi ve Sıcaklık İlişkisi",*Balıkesir Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, Sayı: 5, Mayıs 2001.
10. **Korkmaz, E.** (2014), "*Hakkari'de Aşiret ve Siyaset İlişkisi (1880-2011)",* Ankara: Sitav Yayınları.
11. **Penvin Rauf Hadi** (2018). Dem Digotinên Mezinanda Li Devera Bahdinan, I. Uluslararası Zap Havzası Sempozyumu (27-29 Nisan 2018), Hakkari Üniversitesi Yayınları, Canset Matbaacılık, Ankara.
12. **Özcan, S.** (2015)."*Türk Atasözlerinde İklim, Mevsimler, Hava Olayları ve Halk Takvimi"*, Uluslararası Araştırmalar Dergisi, Cilt:8 Sayı:36 Şubat 2015.
13. **Özdemir, M. A. ve Bozyurt, O**. (2006). "Afyonkarahisar Halk Takviminin Sıcaklık Verileri İle Karşılaştırılması", *Doğu Coğrafya Dergisi,* Sayı.15, Erzurum.

## Perawêz:

(1) File têd wateya rêncberî û çoktkariyê.

(2) Zipe: zivoruke ku bi daran di ête çêkirin. Zîpe darîke kê çê diken û di dene ber bi bagerê . dema xweş bi zivirît wê sal Xweş bit.

(3) Keşke: Mast û dahni pêktet.

(4) Şatax û Nêdwan, du gundin, giredayî Colemêrgene

(5) Kürtçe Ay isimlerinin ikili olması şivelerden kaynaklanır, bilindiği gibi Kürtçe yazında 4 şiveden oluşur: Kurmanci, Zazaki, Sorani, Gorani.

(6) Naz: jinekî Serspî ya dawetê bû.

## تقويم جولمرك وتأثيره الاقتصادي والاجتماعي


الملخص:

لقد اهتم الكُرد ومنذ القدم بالتقاويم وتقسيمات فصول السنة، وذلك بسبب ارتباط تلك الفصول بحياتهم الاقتصادية والاجتماعية، وقد انعكست والحالة هذه على حياتهم الثقافية، إذ عبر الكُرد عن سمات كل فصل والتغييرات المناخية على شكل نصوص أدبية انتشرت بكثرة في الفلكلور الكردي.

يتناول هذا البحث التقويم السنوي في تراث منطقة جوليمرك، حيث الواقع المناخي الصعب، وانشغال سكانها بالرعي والزراعة في حياتهم الاقتصادية مما دفعتهم الى الاهتمام بتغييرات الطقس والمناخ لارتباطهم بحياتهم اليومية، وبالتالي انعكاس هذا التقويم في فلكلور سكان جوليمرك.

ان التقويم السنوي في جوليمرك هي نفسها التقويم الشرقي التي يختلف عن التقويم الميلادي بـ(٥٨٤) سنة و (١٣) يوماً، ولكن تفاصيلها تختلف باختلاف المناخ والطقس والطوبوغرافيا في منطقة جوليمرك.



**الكلمات الدالة:** *التقويم، جوليمرك، السنة الرومية، المناخ، الفلكلور*

## The calender at jolamerg and its economic and social impact

**Abstract**:

All along the time Kurds people have found the time precious for their that, as an economical, cultural, sociologically made a part of their life in this time slice. İn this mean, examined in a different sense of each month. These time slots formated along with following elements; livestock, farming and other rural life. Kurds living geography is steep and mountainnous so husbandry very commonly, thereby performing periodic planning is a more important phenomenon. İf the time did not pass with a good plannig, people who is dealing with livestock, would be face serious economic problem. Every individual, he/she lives in a society from one generation to another, he or she live in certain order. People even though live in a socety, their own truth of life, formating by society and course of history also contributes its. When was plannig which depend on climate, legent of ancestors affect the way for next generation to continue same way. We w'll next stage explanaiton weather conditions or specific changes of months wia proverbs and couplets.

In this matter, Kurds have set calendar according with their dificulty for example, abide by Gregorian Calendar January 14, in Kurds would January 1. So it have 13 day variation. Mybe that difference is based on the time inequality between Rumi and Gregorian Calendar. Expecially timing has done in Turkey's Kurds. Sociologically human relations shaped by cold, heat and economic behavior. For instance Grass cut time, any human could't making wedding because time of farm-garden would be left behind hence Weddin made in winter usually. Giddens determinetion about social phenomenon, take link between life history and historical flow lead us to W. Mills "Sociological Imagination" .

**Keywords:** *Kurds, Folk Calendar, Climate, Storm (Qelp), Months.*

Zakho Centre
for Kurdish Studies
سەنتەرێ زاخۆ بۆ ڤەکۆلینێن کوردی